

**Ji bo dêûbavên, zarokên wan
diçin kreşên Berlinê**

12.03.2021

Agahiyên ji bo dêûbavan ên li ser derfetên temamker ên lînêrînê yên ji bo zarokên nikarin sûdê ji xebateke asayî ya hêlîna zarokan bigirin, ji ber ku gava bi nexweşiya Covid-19ê bikevin rîska derbaskirina pêvajoyeke dijwar a nexweşiyê bilind e yan jî nasekî wan yê nêzik di rîskeke bilind de ye.

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

Zarokên, ku di komeke rîskê ya wisa de bin, ji ber sedemên tenduristiyê piranî nikarin sûdê ji xizmeta hêlîna zarokan a asayî bigirin an jî bi awayekî gelek dorbisînor jê sûdê digirin. Dibe ku ew zarok jî di heman rewşê de bin, ku dêûbav, dapîr û bapîr an jî xwişk û birayên wan di komeke rîskê de bin û ew di nav heman malê de bijîn. Bi vê yekê re ji bo tevahiya mexdûran zehmetiyên cûrbicûr pêk tên.

Divê her wisa ji bo van zarokan jî dîsa derfeta sûdgirtina ji perwerdehî û lînêrîna zarokên biçûk bê afirandin û bi vî awayî barê dêûbavan sivik bibe. Ji ber vê yekê Welatê Berlinê bi hevkarên xwe yên peymanî gihast lihevkirinekê, ku derfeta lînêrîna di çarçoweyeke gelek parastî de were bicîanîn. Li ser vê bingehê piranî divê wisa were famkirin, ku komên biçûk û neguherbar çêbin, ku bi vê yekê re xizmeta lînêrînê bikaribe li hêlîna zarokan an jî her wisa li derekê din jî were dayîn. Di bûyerên taybet de lînêrîneke bi awayê saetan jî dikare li nav mala malbatê jî pêkan be. Biryara li ser şeklê vê xizmetê di berpirsyariya saziya hêlîna zarokan de ye. Me ji tevahiya saziyên hêlînên zarokan bi awayekî acîl rica kiriye, ku demildest xizmeteke lînêrînê pêşkêş bikin. Em dizanin, ku ev demeke dirêj e, hûn li benda vê yekê ne.

Şertê ji bo sûdgirtina ji vê xizmetê ew e, ku gava zarokê/a we yan jî kesekî di nav heman malê de dijî bi nexweşiya Covid-19ê bikeve, rîska wan a derbaskirina pêvajoyeke dijwar a nexweşiyê bilind be û divê ev yek ji aliyê doktorî ve were piştrastkirin, ku zarokê/a we ji ber vê yekê nikare sûdê ji xebateke asayî ya hêlîna zarokan bigire.

Em bawer dikin, ku hêlîna we ya zarokan di derbarê vê mijarê de bi we re axiviye. Heger ev axaftin hêj pêk nehatibe û şertên li jor hatine ravekirin ji bo zarokê/a we hebin, ji kerema xwe re bi hêlîna xwe ya zarokan re pêwendî deynin. Bi hev re biaxivin, ka derfetên hêlîna we ya zarokan di mijarên pêwîst ên rêxistinkirin û xebatkaran de hene, ku bikaribe xizmeteke bi vî awayî ya lînêrîne bide we. Gava pêwîstiya zelalkirîne hebe, Çavdêriya Hêlînên Zarokan piştgiriye dide saziyên hêlînan, ango li ku derê potansiyelên ji bo xizmetên lînêrîne yên bi vî awayî dikarin werin bikaranîn û ka ev yek pêkan e.

Fînansekirina vê xizmeta lînêrîna zarokan bi riya serlêdana saziya navenda lînêrîna zarokan a danê rojê pêk tê. Saziya hêlînan ne mecbûr e, ku xizmeteke bi vî rengî bide. Her wisa demên, ku zarokê/a we li gorî vê yekê sûdê ji lînêrîna zarokan digire, dibe ku kêmtirî mafê we be, ku li ser kûpona we ya hêlîna zarokan hatiye diyarkirin.

Gava saziya we nikaribe xizmeteke bi vî awayî bide we, em ê li gorî daxwaza we binêrin, ka ji aliyê saziyeke din ve xizmeta lînêrîne (demkî) bo zarokê/a we pêkan e.

Gava bala we bikişîne, tika ye li ser vê xwe bigihînin me kita-risikomittel@senbjf.berlin.de

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk